**Agahî a ji bo niştecîhên nû**

Kesên ku li herêma Basel nû ne, divê bi niştecîhên ku şaredariya qeyd bike. Ji bi qeyd girine, divê hûn
forma qeydê,
pasaporta xwe
û ji bo piştrastkirina rûniştinê te yên berê.

Li Kantona Basel-Stadtê ji bo ku ew kesên nû barkirine bi firehî werin agahdarkirin, rêxistinên bi zimanên almanî, frensî, spanî, îtalî û portugalî hene. Ew rêxistin wek xêrhatineke tên avakirin.

Li Kantona Basel-Landschaftê kesên ku nû hatine wir ji aliyê rêvebiriya koçberan ji bo axaftineke yekemin tên vexwendin. Ew hevdîtinên yekemin her dem bi zimanên koçberan pêk tên û li ser jiyana li wan herêmên ku wan barkirine agahdar dikin. Ji şaredariya cihê xwe bipirse!

Koçber piştî qeydkirinê ji şaredariyê ku wan xwe li qeydkiriye, destûra rûniştinê distînin. Ji bo biyaniyan destûrnameyên rûniştinê yên cuda hene:

Nasnameya L ji bo demekê kurt e, hilgir dikarin di wê demê de bi an bê kar bibin
Nasnameya B ji bo mayîna salanê ye, hilgir dikarin di wê demê de bi an bê kar bibin
Nasnameya C ji bo bicihkirinê ye, hilgir dikarin li Swîsreyê bê astengî bijîn
Nasnameya G ji bo karkerên ku li sînorê Swîsreyê dijîn û li li Swîsreyê kar dikin re ye.
Nasnameya F ji bo penaberên ku ji Swîsreyê hatine qewitandin lê derkirîna wan hin nehatiye pêkanîn e.
Nasnameya N ji bo penaberên ku pêvajoya wan a penaberiyê hin didome ye.

Ew nasname ji aliyê rêvebiriya koçberan ve tên dayîn û divê bi rêzdarî werin dirêjkirin. Ji bo dirêjkirinê koçber bi xwe mesûl in. Ger ku tu bixwazî malbata xwe bibînî Swîsreyê, divê tu çend merc û daxwaznameyan binî cih û pişt re tu dikarî ji bo anîna malbata xwe serî lê bidî. Ji bo agahiyên zêdetir bi almanî, frensî, îtalî û înglîzî tu dikarî li sem.admin.ch binêrî. Li ser malpera sekreteriya dewletê ji bo penaberan bibînî. Agahiyên bi zimanên din tu dikarî li ser malpêra migraweb.ch bibînî.